Gedeon Richter

# Bemfolapre pênûsa-derzî çawa tê bikaranîn



Ji we re Bemfola hat reçetekirin û ev rûpela telîmatnameyê dê nîşanî we bide ka hûnê pênûsê çawa bi kar bînin.


Bemfola 75 IU/0.125 ml
Bemfola 150 IU/0.25 ml
Bemfola 225 IU/0.375 ml
Bemfola 300 IU/0.50 ml
Bemfola 450 IU/0.75 ml
Solusyona derzîkirinê ya nav pênûsa-derzî.

bemfola
follitropin alfa

## Tiştên ku bên bîranîn:


*Destên xwe bişon*
*Derziyê her roj heman saetê li xwe bidin*
*Pênûsa xwe 5–10 deqîqe beriya bikaranînê ji sarincê derxînin*

# Beşên cuda yên pênûsa we





- **E** **Derzî**
- **F** **Qapaxa hundir a derziyê**
- **G** **Qapaxa derve ya derziyê**
- **A** **Dozaj**
- **B** **Bişkovka dozajê**
- **C** **Şîşika aktîvasyonê**
- **D** **Kartûşa bi îlac**

# Amadekirina derziya xwe





Etikete ji ser derziya enjeksiyone rakin.
Pênûsê bi kêlekên xwe ve girê bidin û derzîyê bi **niximandina pênûsê ve girê bidin**.
Hişyarî: Di dema pêvedana derzîyê da, destikê dosajê neavêje hundir.

Pozîsyona rast a derzîyê




Pozîsyona nerast ya derziyê






Qapaxa derve ya derziyê derxin. Wê ji bo careke din veşêrin.
Piştî derzîkirinê ew ê ji we re lazim bike.
Qapaxa hundir a derziyê derxin.

Pênûsê wisa bigirin ku berê derziya wê bikeve jor.[1]
Bişkovka dozajê pal bidin ta ku disekine.
Şîşika aktîvasyonê winda dibe û divê hinek lîkîd jê bavêje derve – ev normal e.[2] Eger lîkîd jê neavêje derve, pênûsê bi kar neynin, yeke nû hilgirin.





# Eyarkirina dozê

Bişkovka dozajê bizivirînin ta ku doza ji we re hatiye reçetekirin were ser xeta ekranê.
Pênûs niha amade ye ji bo derzîkirinê.





# Derzîkirina li xwe

Zûka lîkîdê (wek edetî nav zikê xwe) li gor telîmatên bijîşk an jî hemşîreya xwe derzî bikin. Bi awayekî nerm çermê li cihê derzîkirinê bigivêşin û derziyê tê re bikin.
Hişyarî! Gava ku hûn derziyê dixinê bişkovka dozajê pal nedin!




Bişkovka dozajê hêdîka û domdar paldin ta ku ew disekine û şîşika dozê winda dibe.
Derziyê zûka dernexînin. Beriya derxistinê 5 saniyan bisekinin.

Piştî derzîkirinê: Qapaxa derve ya derziyê biguherin û derziya bikarhatî bixin nav tişteke girtî (wek şûşe an jî qotiya şîr)û wê bavêjin nav zibilên malê.
Ekîpmanên mayî yên bikarhatî jî bavêjin nav zibilên malê.



## Nav sarincê veşêrin (2°C – 8°C). Nekin cemed. Ji bo 90 rojan dikare ji sarincê bê derxistin û di germahiya odê de bê veşartin (zêdetirîn 25°C).




| Bemfola 75 IU *0,125 ml* | Bemfola 150 IU *0,25 ml* | Bemfola 225 IU *0,375 ml* | Bemfola 300 IU *0,5 ml* | Bemfola 450 IU *0,75 ml* |
|---|---|---|---|---|
| **75 IU** | **150 IU** | **225 IU** | **300 IU** | **450 IU** |
| 62,5 IU | 137,5 IU | 212,5 IU | 287,5 IU | 425 IU |
| 50 IU | 125 IU | 200 IU | 275 IU | 412,5 IU |
| 37,5 IU | 112,5 IU | 187,5 IU | 262,5 IU | 400 IU |
| | 100 IU | 175 IU | 250 IU | 375 IU |
| | 87,5 IU | 162,5 IU | 237,5 IU | 350 IU |
| | 75 IU | 150 IU | 225 IU | 337,5 IU |
| | | | | 325 IU |
| | | | | 300 IU |

BEM-DEC-ENG-17282:1

**Agahiyên zêdetir derbarê vê îlacê li vê navnîşanê peyde dibe** http://www.ema.europa.eu
Agahiyên zêdetir ên nîşandarî li vê navnîşanê peyde dibin www.youtube.com
Ji bo welatên Bakurî jî, agahiyên zêdetir ên berhemê li vê navnîşanê peyde dibin:
– Swêd: www.fass.se
– Fînland: www.laakeinfo.fi
– Danîmarka: www.ema.europa.eu
– Norwêc: www.felleskatalogen.no

**Peywirdarê Karê Bazarkirinê û Hilberîner:**
Gedeon Richter Plc.
Gyömrői út 19-21.
1103 Bûdapeşt
Macaristan

Gedeon Richter